# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* Newroz95@hotmail.com

| Hejmar(74) | Hizêran | 2007 z-2619 k | Buha (15 ) p.s |
|---|---|---|---|

# 50-î Saliya avakirina rêxistina siyasî a kurd a yekemîn li Sûriyê

**Sînorê Yekta**

Li 14-ê Hizêrana 1957-an , li bajarê Helebê civateke dîrokî ji heft camêran dihate lidarxistin , tê de , biryara damezrandina partiyeke siyasî û demokrat di nav kurdên sûriyê de erê dibû . Ew heft camêr jî evên he bûn: Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Hemîd Derwîş, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed, Şewket Nesan û Hemze Niwêran. Û hêjayî gotinê ye ku , qonaxa ji berî 1957-an , bi çalakiyên hinde komeleyên rewşenbîrî û civakî hatibû zengînkirin , digel rola derçûna kovara Hawarê li ser destên bedirxaniyan li Şamê û belavbûna hejmarên wê di nav xwendekarên kurd de .

Piraniya xelkê li seranserî herêmên kurd berê xwe didane vê partiya nû , û bi dilgermî jê re dibûne alîkar û piştgir.


Kêm-zêde piştî salekê ji aşkerekirina damezrandina partiyê , herdu camêrên navdar Dr.Nûredîn zaza û helbestvanê gelêrî Cigerxwîn (Mile Şêxmûs) derbazî nav rêzên rêxistina partiyê dibin û dibine egera ku hê bêtir rola partiyê di nav gel de geş bibe û bêtir ciyê xwe bigre.

Karbedestên dewletê bi diltengî û çavsorî li liv û hebûna vê partiya kurdan dinihêrîn û tevdîrên tund li dij distandin , dixwestin ji hev bişelînin , ji hev bixin û ji ortê rakin , lê nikarîbûn . Ji ber ku ne tenê rêxistineke siyasî bi rêvebiriya çend ronakbîran bû û hew , lêbelê bûbû rêxistina gel , partiya civaka kurd , partiya xwendekaran, ya cotkar û gundiyan , ya hinde mile , şêx, axa û began , ya xortan , mêr û jinan , partiyeke netewî kurdhez û demokrat bû , lewre jî berdewam dibû û dijî , tevî ku bûyer û qonaxên ku tê re derbaz bûye bi êş û zor dijwar bûn , nemaze ji hevcudabûn , **D.R ( 12)**

www.arsivakurdi.org

## Mele Mihemedê Neyo
## Ji nav me bar kir

Roja çarşemê, 16.05.2007an, li paytexta welêt Şamê, dilê xebatkarê kurd ê dengewar **Mele Mihemedê Neyo** rawestî. Seydayê buhiştî, ciwaniya xwe û piraniya temenê xwe, di ber doza gelê xwe yê dadmend de derbas kiriye, gelek cefa, girtin û veşartin di riya xebatê de dîtine.




Gelê kurd jî, tucarî xebatkarên xwe ji bîr nake, nûnerên tevgera kurd digel cemawerekî mezin, pêşwaziya termê seyda li derveyî bajarê Qamişlo kirin, ew di mezelê Hilêliyê de sipartine axa welêt. Gotin bi navê Hevbendiya kurd, Bera kurd û komîta Tensîqê … û hine dîtir, derbarî têkoşîn û xebata Seyda hatin pêşkêşkirin .

Bila cihê te buhşt be seyda, serê meriv, malbat, dost û hevalên te sax be.

## Helbestvanê Kurd
## Seydayê Keleş koç bar kir

Roja Duşemê 18.06.2007an, dilê helbestvanê kurd Sedayê Keleş piştî 77 salan rawestiya.Mele Hisên(Seydayê Keleş), li gundê Bizgûrê, sala 1930 ji dayik bûye, ji piçûkaniya xwe ve dest bi hînbûna xwendina olî kiriye, paşê guh li ziman û wêjeya kurdî daye, hevaltî û dostaniyeke xurt di navbera wî û Sydayê Cegerxwîn de çêbûye û di tevgera kurdî ya rêzanî de cih girtiye, kar û barê kurdewariyê hilgirtiye ser milên xwe ji dil û can, bi dilsozî, ta roja dawî ji temenê xwe, ji bo doza gelê xwe kar û xebata rêzanî û wêjeyî kiriye.

Ji berhemên Seyda yên çapkirî: Em û dijmin, Rêka gel, Derdê millet, Ronahî, Xebat, Gotinên pêşiyan. Yên destnivîs: Helebçe, Berbang, baxistan, Bîranînên min.

Piştî nîvro, bi beşdariya hizaran ji dost, heval, rewşenbîr û nûnerên tevgera kurdî li Sûriyê, laşê seydayê keleş, di goristana Qidûr Beg de hate veşartin. Gelek gotin, helbest û birûsk hatin xwendin, mîna: Gotina Bera kurdî, Komîteya Tensîqê, partiya pêşverû ya kurd, Rewşenbîr û nivîskarên kurd, gotina Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yên li Sûriyê têne weşandin, helbesteke şêrîn ji bal seyda Rifet ve hate pêşkêşkirin, seydayê Mele Elî helbesteke seydayê Keleş ji beşdaran re xwend…û gelekên dîtir, bi gotina malbatê, rê û resmê veşartinê bi dawî hat.

Li jêr, em deqa gotina kovar û weşanên bi zimanê kurdî yên li Sûriyê têne weşandin didine belavkirinê:

*Îro, em bi dilên xemgîn û şikestî, xatirê dawîn ji mamosteyê xwe,* ***Sedayê Keleş*** *dixwazin.*

*Navê* ***Seydayê Keleş****, di asîmanê helbest û wêjeya kurdî li Sûriyê de, navekî berz, bilind û rûmetdar e, çimku, wî temenê xwe, ji bo xebatê di ber doza gelê xwe û zimanê kurdî yê şêrîn de terxandibû, helbest û gotarên wî, kovar û weşanên me dixemilandin, dilê xwendevanên zimanê kurdî bi wan geş û şa dibû. Herweha, wî xwe di warê folklor û kelepûra kurdî de jî westandibû.*



*Bêgomane ku, bi saya serê mezin comerdên me, îro em bi zimanê dayika xwe dixwînin û pê dinivîsin û karwanê rewşenbîriya bi zimanê kurdî bi rêve dice.*

*Bi navê Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yên li Sûriyê têne weşandin, em serxweşiya xwe, malbat, dost û hevalên Seyda dikin, ji Xwedê tika dikin ku cihê seydayê me buhuşta rengîn be û serê we hemiyan sax be!*

***Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yên li Sûriyê têne weşandin***

www.arsivakurdi.org

# Li gundê **Mozelanê** Dîtinek Bi Rêzdar **Hecî Dihamê Mîro** re

**Apê hêja, li destpêkê, bi navê weşana NEWROZ ya ku bi zimanê kurdî li Sûriyê tê weşandin, em hêviya saxlemî, tendurustiyeke baş û temenekî dirêj ji we re dikin.**

Di baweriya me de, gelê kurd, miletekî wefadar e, tucarî ew xebatkar û têkoşerên xwe ji bîr nake, rêz û rûmeta wan bilind diparêze, ji ber ku nifşê me yê îro, bi saya xwedê û serê wan xebatkaran îro xwe kurd nas dike, li zimanê dayika xwe xwedî derdikeve, xwîna kurdayetiyê di damarên wî de digere.

**1-**Pirsa me ya pêşîn ew e ku hun ji kerema xwe re, kurtejiyana xwe ji xwendevanên Newrozê re pêşkêş bikin?.

***Bersiv***:*Ez **Dihamê Mîro yê Mîro**, ji êla **Hesina** me, sala 1921an, li gundê **Sêgirka Mîro** ji dayik bûme, vêga, temenê min 86 sal e. Eve bêtirî 500 salî ye ku êla me li vê derê cîwar bûye. Bavê min, di komîta danîna sînorê navbera Sûriyê û Tirkiyê de endam bû. Niha, ez bê nasname me, ji ber ku di sala 1968an de, ew ji min hatiye kişandin, mixabin, niha, di welatê bav û kalên xwe de, ez biyanî me!!...*

**2-**Li gor em dizanin, di sala 1965 an de, Partî bûye du parçe, kongirek li kurdistana Iraqê ji bo yekîtiya partiyê hatiye li darxistin. Hun dikarin li ser vê babetê ji me re baxivin?.

*Bersiv:Ev kongirê ku hun dibêjin, di dawiya Avdara sala 1970an de, bi serperiştiya seydayê **Barzanê** li **Nawperdanê** hate li darxistin. Rêzdar **Derwêşê Mele Silêman** wê demê li Kurdistanê bû, weke mirovekî welatparêzî xweser, ji bo pêkanîna girêdana vî kongirî xebitî ye. Endamên kongir, ji herdu aliyên Partî(Çep,Rast) digel beşdariya hin kesayetiyên xweser ku ji kurdistanê em hatin vexwendin hate li darxistin.*

**3-** Rêvebiriya demkî(Qiyada Merhelî) çawa hate damezirandin, endamên wê kî bûn?.



*Bersiv: Rêvebiriya demkî ji 13 kesan pêk hatibû, stubarê wê ew bû ku herdu aliyên Partî(Çep û Rast) bikin yek. Endamên wê, 4 endam ji ber aliyê Çep ve, 4 endam ji ber aliyê rast ve, digel 5 kesayetiyên xweser. Li gora tê bîra min, navê wan rêzdaran ev bûn:*

** Ji aliyê Çep ve: Ismetê Seyda, Ûsivê Dîbo, Behcetê Mele Mihemed, Şefîqê Elo bûn.*

** Ji aliyê Rast ve: Temirê Mistê, Ibrahîmê Sebrî, Fêselê Hadî Axa,Restemê Mele Şehmo bûn.*

** Kesayetiyê xweser jî: Şêx Mihemedê Îsa, Selîmê Ûsivê Haco, Derwêşê Mele Silêman, Sadiq, Dihamê Mîro bûn.*

*Komîteke şêwirdar jî hate bi navkirin, endamên wê jî ev rêzdar bûn: Mihemedê Mele Fexrî, Ebdela yê Mele Elî, Xalidê Meşayix, Kenanê Egîd, Mecîdê Haco. Piştî vegera me ji Kurdistanê, me hewil da ku em serkirdayetiya Partî bidin ser hev û li gor ji me tê xwestin,*

→

www.arsivakurd.org

*em yekîtiya Partî vegerînin. Lê, sed mixabin, her layekî endamên xwe yên berê vegerandin kar, yên rûniştî bûn vegerandin rêxistina xwe, da her layek ji me re bide xuyakirin ku hejmara endamên wan ji ya layê din pirtir e…Me kir, ne kir, wan li hev ne kir û hewildanên me ji bo yekîtiya Partî têk çûn.*

*Di payiza sala 1972an de, kongireke din li **Bamernê** hate damezirandin, komîta Navendî ji van rêzdaran dihate pê:*

*Dihamê Mîro(Sekreter), Kenanê Egîd, Nezîrê Mustefa, Hemîdê Sîno, Ilyasê Remiko, Şêxmûsê Baqî, Mehmûdê Sebrî, Mustfayê Ibrahîm, Hûrîk, Zekeriya, Şêx Emîn Gulîn.*

**4-** di 1-ê Tebaxa sala 1973-an de, ji ber hilwesta PARTÎ ya dij pilana Kembera Erebî, dezgehên ewlekariyê êrîş birin ser gundê Mozelanê ji bo girtina we, bi hovîtî gule berdane xelkê, mirovek hate birîndarkirin, ew bûyer çawa çê bû, kî hate girtin, kî li derve ma?.

***Bersiv**: Di wê şevê de, civînek li gundê me **Mozelanê** pêk hat, tevî ku li ba me biryar hebû, gundên endamên komîta navendî tê de hebin, ji bo parastina wan û ya Partiyê, divê ti komcivîn di wan de çê nebin, ji ber ew gund di bin çavdêriya dezgehên asayişê de bûn. Herdu nobedarên min jî çûne wê civînê. Rezekî me nêzîkî gund hebû, ez çûme nav rêz, li wir, rûniştim, çavên min çûne ser hev û ez xilmaş bûm, rabû ez çûme malê, derî li xwe girt û razam. Asayişa dewletê bi ser gund de hatin, ji birayê min **Mihemed** xwestin ku mala min şanî wan bide. Ji birayê min we ye ku ez ne li malê me, ji ber wî birayara komîta navendî zanîbû divê endamên komîta navendî li malên xwe ranezin.Li derî xistin, min bi xwe derî ji wan re vekir, min dît ku asayiş e. Min hewil da ku ez xwe nedim dest wan, lê, derfet nema bû, ez û kurê minî piçûk **Kenan** girtin, bi hovîtî destên min kelemçe kirin û dest bi berdana guleyan kirin. Di encam de, mirovekî gundî bi navê **Emerê Hecî Mihemed** hate birîndarkirin. Wê şevê, em ji Dêrikê birin Qamişlo, min dît ku vaye hevalên min jî girtî ne, pişt re, em rakirin Şamê.*

**5-** Piştî girtina Rêvebiriya Partî, çawa kar û barê rêxistinê birêve diçû?.

***Bersiv**: Piştî girtina me, rêzdar Hemîdê Sîno û rêzdar Ilyasê Remiko kar û barê rêxistinê bi rêve dibirin.*

**6-** Çend salan hun di zindanê de man?

***Bersiv**: Em ne bi hev re hatin berdan. Yê min bi xwe, ez 6 sal û 8 mehan di zindanê de mam. Dema şerê çekdarî di navbera rijêmê û rêxistina (Ixwan al muslimîn) de derkete holê, em berdan.*

**7-** Têkiliya we di zinadanê de bi hev re çawa bû, çi ji hundirê zindanê tê bîra we?.

***Bersiv**: Bi rastî, li destpêkê, em ne li cem hev bûn, em di zindanên tekane de bûn, haya me ji hev tune bû, lê, di payiza sala 1973an de, piştî şerê bi Israyîlê re, gelek Cihû hatin zindankirin, rê di zindanên tekane de nema, rabû em kurd anîn cem hev.Têkiliyên me bi hev re biratî û dostane bûn. Piştî 3 salan di zindana parastina hudirîn de, em guhestin zindana **Al Qela**, ji nû ve, rê dane me ku di bin çavdêriya berpirsiyarê zindanê de em pêşwaziya xwedî û malbata xwe bikin, lê,* **D.R.(11)**

www.arsivakurd.org

# Apê Adîk çû ser dilovanya xwe

**Parêzer Mistefa Mecîd**

Di Roja 01.06.2007 dengbêj û stranbêjê herêma Efrînê **Adik Hesen Necar** ku weke Apê Adîk dihate naskirin, di 100 saliya xwe de çavên xwe girtin û çû ser dilovaniya xwe. Ew di sala 1907 de ji dayîk bûbû.

Ew du caran zewicî bû, û bavê 7 keç û 3 lawan bû.Cenazeyê Apê Adîk bi toreneke mezin û bi beşdariya zêdetirî 1500 kes li herêma Kurdaxê (Efrînê) li gundê KORA u şêweyek merasimî hate rakirin . Di pêşî de komikik bi cilên filklorî digel qefdên çîçekên reng rengî û tabût li ser milên giropek ji hunermendên kurdaxê hêdî hêdî berve goristana gundê KORA çûn , li wir bi heyamek şînwarî kirin bin axa



pîroz û gotinek bi navê xelkî gundê Kora parêzer Mistefa mecîd xwend têde li ser jiyana nemir (ADÎK) û rola wî girîng di parastina filiklor, çand û kultûra kurdî û hunera resen , apê Adîk di jiyana xwe de gelek astengên aborî û rewşeke perişanî borand û jiyana civakî ya wî ne rihet bû birina wî ji du jinan re kêfxweşiya wî têrnekir, piştî berdana jina ya yekê (Xortê) jiyana xwe bi ya din re (zêneb) di tevliheviyekê de derbaskir , xwêş û nexweş , rojekê rind bû û du rojan qeher bû , zêneb zêdetirî (15) salan mirî li dirêjiya wan salan apê Adîk bi tenê di oda xwe de jîna xwe derbaskir tevî ku kurê wî bi çûk (Mistefa) qîmeta bavê xwe rind Dizanî. Lê ewjî û ji ber rewşa ne baş dirêjiya salê li Libnanê bi kar derbasdikir , apê Adîk ne dixast kes xizmeta wî bike heta vê dawiyê karê necariyê dikir û tembûr jî çêdikirin û difrotin ,

Apê Adîk taybetmendiyek di muzîka wî de hebû ew xasiyet bi tena wî ve girêday bû tembûra wî biçûk û (16) perdeyî muzîkek nû avakir û şêweyek cudatir dajot , gava li tembûrê dixist lihev hatinek di navbera tiliyên wî û têlên tembûrê de çêdibû ew dibû sedema ragîhandina afsaneke mûzîkî ,û qijmorekên tîştîşî li ser rûyê wî weke tîpên Mêxî çêroka jiyana wî hewil dide, jiyana tevde êş û nalîn ...

Nivîskarê ku ji nizîk ve jiyana Apê Adîk dişopand, dibêje, wî li ser amûrên muzêkê dida, yek ji wan keman bû lê dev jê berda ji ber ku awazên kemançe jiyana mirov kindike, Apê Adîk xizmete mezin ji strana kurdî ya klasîk re kiribû. Û Gelek stranên weke Memê Alan, Sînema ser bi dûman, Teyar, Seyad Ehmed, Dewrêşê Evdî, Cebelî, Edûlê…û H.W.D .

Ew di jiyana xwe ya mûzîkî de bi stranbêjên wek ( Hemûş kûrik , Îbramê Tirko , Cemîl Horo …û, H.W.D ) tesîbû û rolek girîng di pêşxistina hunera wî de hebû .

Hezar rihmet li giyana nemir Apê Adîk û bi hêviyên şopa te berdewam be.

www.arsiv.kurdi.org

# Kuştina Du'a ya 17 e salî

**Zîna şikakî**

Mixabin, hê di nav kurdan de tê gotin : Ger filan kes mêr bûya wê namûsa xwe bişuşta ! heniya xwe hilmaşta ! serê xwe di nav xelkê de bilind bikira ! çêlek navê naxirekê xerab dike ! jinek navê êlekê xerab dike ! ma heqê wê dêlkê ne qurşîneke!

Hezkirin û kîn, kuştin û jiyan, mirovatî û hovîtî, serbilindî û ser-nizmî, rû-sipîkirin û rûreşkirin, bi guneh û bê guneh, şer û xêr, ronahî û tarîtî, binamûsî û bênamûsî. Di ferhengan de, gotinin dij hevin, û di navbera wan de tayek dezî ye, zû diqete, û mirovê nezan, zû-zû ji alîyekî derbasê yê din dibe .

Hezkirin rengek ji rengên nexweşiyê ye ; nexwaşiyeke bi lizet û xweş e ; kes nikare dijî wê bibê, û ne jî rûyê xwe li ber vê rastiyê reş bike, yek ji durv û xûyên mirovatiyê ye ; tu dara ku ba li sêrî nexin nînin. Kuştin jî rengek ji rengên nexweşiyê ye, lê hema nexweşiyeke pîs û genî ye .

Du'aya 17 salî çi guneh kiri bû? Ew bê guneh bû ; ên ku ew bi hovîtî kuştine gunehebar in. Tu gunehê wê tune bû, dilê wê tijî hezkirin bû ; dilê kesên ku ew kevir kirine, kuştine, tijî kîn bûn. Hezkirin ji miorvatiyê tê, lêdan û kuştin ji hovîtiyê tên. Dema mirov karên qenc bike, serê mirov bilind e, rûyê wî sipî ye ; zor, lêdan, kuştin serê mirovan nizim dike, û rûyê wan reş dike, wan gunehbar dike. Bênamûsiya mezin ew e ku keçikeka 17 salî bi wê hovîtiyê were kuştin. Di hemû reweşt û 'adetên dunyayê de hezkirin qenci ye, xêr e, ne pîsitî û şer e, mirov, ji însanan, ji welatê xwe, ji Xwedê, ji jiyanê hez dike, ger keçek bi hezkirna xortekî navê êlekê xerab dike ! kuştina wê



bi wê hovîtiyê , navê miletekî, gelekî xerab dike. Jin mirov e, jiyanê diyarî mirovan dike, kuştina wê ne mirovatiye, çawe emê mafên xwe yê mirovane daxwaz bikin ! û mafê mirovan biparêzin ! ger em mafê jiyanê ji jin, xûşk û qîzên xwe distînin .

Ev kuştina bi vî hawî, ne pênûs ; ne gotin ; ne hêstir ; ne sîlên ser çavan ; û ne jî kutên sîngan dikarin dilê mirov rihet bikin ; hiş û hestê mirov hêsa bikin, bêhna hovîtîyê ji vê kuştina hanê hildikele. Em ji welat, ziman, dîrok, û xwaka xwe hezdikin, dijmin me bi hovîtî dikuje ; lê ew dijmine ! şerên birakujiyê di navbera me de çê bûne, hema ew hizbîtî (partîzanî ye)! di dîrokê de 'eşîr û malbet li hember hev rabûne şer kirine sedemên wê hebûne ; dewlet û hukûmet li hember hev radibin, şer dikin, bercewandî, û talankirin sedemên wê ne ; dijmanyetî hebûye. Lê hema kuştina keçeke (zarokeke ! ! ciwaneke) hefdeh salî li navîna kolan ê, bi lêdana keviran, bi destê nêzktrîn kesên malbata wê li ber çavên dê ! !, xûşk, xaltîk, met û jninên cîran ! ! ! dide ser hemî rengên hovîtiyê, ji ber ku hezkirin sedemek ji sedemên jor dûr e,

→

hezkirin mirovan berve hev tîne, ne li hember hev radike, jineke di malbeteka bi vî rengî de tîmar bûbe, belkî cegera li hember hev rabûnê jî pêre tunebû ye, bêguman bi dizî, û tirs dijiya .

Me digot, û em dibêjin : firotin û kirîna jinan şerm e, zewaca bê dilê wan ne rast e, lêdan û îhanet, û newekhevî jî ne di cîh de ne, ma gelo, kuştina keçeke bi vî awî, çî ye ? rû-reşîyeke civakî, olî, û gelî ye. Em di sed sala bîst u yekan de dijîn ! hêdî êzdî jî keçên xwe bi kevir-lêdan a heya bi mirinê bi kar tînin ! ! ! wey heft xaliyên germ li serê olperestên nezan be .

Di siha rêjîma olî, tarî ya Îranî , û hin welatên îsmalî yên din de jî, jin bi vî awî li çate-kolana, an meydanên bajaran têne kevirkirin, da ku ji hemî jinan re bibin ders, û ‘ibret, ku karên wiha nekin !

Divê em, bizanibin ku mesele bi vî awî çare-ser nabin. Divê li ser tîmar kirina keç û kur wer e siknadin, divê rolê jinê bêhtir di civakê de were naskirin ; tirs û fedî ji nav malê rabe ; dan-standin bê zor û bê siwa bin ; nermahî û ferahî di hişê me de ciyê hişkbûn û tengayiyê bistîne; da ku em di ronahiyê de meselan çare ser bikin û ne bi kûranî û di tarîtî yê de gunehên gewre bikin; yan na çawa kerê me yê kulek bi hespên xelkê yên beza re dakeve meydanê .

Kurdistana başûr, di Rojhilata navîn, di dunyayê de deng daye ; li ser tilfizyon, di medya (î’lam) û enternêt ê de, bi qencî ciyê serbilindahiya me hemî kurd a ye çirûskên wekhevî demokrasî û azadiyê tê de vedibrûsin ; û dilê mirov rihet û şah dikin.Deng dana nûçe ya kuştina keça kurd, Du’a ya êzdî, li ser entirnêtê û di medya Ewripî de, tu carî nakeve çarçwa xizmeta serbilindiya gelê Kurd .

Di civakên sîvîl de kuştina pisîkekê, kûçkekî, an çûkekê jî bi vî awî, bê deng derbas nabe. Hawar a me ji nûnerên Hukûmeta Kurdistanê, û ji hemû berpirsiyarên Kurd, çi mêr, çi jin ! !ku biryaran bistînin ; û ceza yên giran û sert, li hemberî van kiryarên hovane, bi kar bînin, da ku Kurdistan di hemû warên jiyanê de, bibe nimûne , û em nekvin xefkên dijminan (êzdî, mislman, ‘elewî û şê’î…) û ne jî em xwe bê guneh bikin. Nezanî û şûnketina xwe jî di pişt guhên xwe re bavêjin, divê em şûjinê çavî xwe berî derziyê çavên xelkê bibînin ; ne jî rahêjên hîmên mezin û kevrikên biçûk ji bîr bikin .

Bingeha civakan, mala mirova ye ; hezkirin, wekhevî, demokrasî ji malê de dest pêdikin ; derbasî kolanê dibin, li bajêr belav dibin, û berê xwe didin hemî deveran. Divê, li çate kolan û çate rêk an, bûk û zave, gul û kulîlk, şona laşa ,bigrin , şahî û dil-xwaşî şona tirs û hovîtiyê bistînin .

Dema em têne, Ewripa, an jî, welatên din, em riweşt û xizam (‘adet û teqlîdên) xwe bi xwe re tînin ; ji ber ku ew ne cilin (kincin) ku em li xwe dikin, û ji xwe dixin ; wan bi salan di hiş û laşê me de rihên xwe berdane . mirov ne dikare wan bavêje, û ne jî bi hesanî biguhêre ; heyam û civak vekiriye ku mirov wan berve guhartineke erênî bibe ; û bi şêweyekî bi rêk û pêk, yên qenc hlîne, û yên xerab jî dev jê berde; divê em çavên xwe vekin ; **D.R.( 11)**

# Gotareke hilbijartî ji Rojnameya KURDISTAN Welat-Weten

***Mîr Abdurehman Bedirxan**
Guhestina tîpan: **Rêberê Silîvî**

Weten, ango welatê miro, cismek we ye ku yên ji wî cismî mutesir dibin, xelqên wê derê ne. De wêca(vêca) hingî miroyên welatekî xwey qiwet bibin, hewqas ax û perê wî welatî xwey qiwet dibe.

Hingê babê min ji Kurdistanê rabî(rabû), ew memûrên hikumet rêdike ser gund û bajarên Kurdistanê, wek mara, xûna xelqên Kurdistanê vedixun. Ne mezina haj kiçika, ne kiçika haj mezina maye. Welatê kurda wek cismekî birîndar bê hal maye. Heger kurd wê birîna memûrên hikumetê li wî cismî vekirîn derman nekin, heyfa min têt, ew cisim, ango Kurdistan, ew ax û perê wî welatî, ew dar û berê wî, ciyê hinde zaro mezin kirîn, hinde miro xweyî kirîn, wê bin xak bibit..!! . Ango Misqof ê bêt ser wê axê rune, zaroyên wî welatî jar û reben bibin, kurd ê bibînin ku ew axa zaroyên xwe hinde delalî mezin kirî, wê bikeve nav destê biyaniya de, ew zaroyên ser wê axê mizin bîne(bûne), wê bibin êsîrên biyaniya, ew bab û dayikên dil nadin bêjin zaroyên xwe avekê bide min, wê bibin xidmetkarên eskerê Misqof, wê xidmetka şerabê ji eskerê Misqof re bikin.

Gelî kurdino, halê we xirab e, haj xwe hebin, heger ûn(hun) deng û destê xwe hilneynin, her ho(wilo) bimînin, ev birîna hikumet li we vedike, wê her mezin bibe heta we dikuje. Kurd hinde ciwanmêr in, sahib xîret in, çire wek pezî nav destê memûrên zalim, heqîr û rezîl bibin?. Ma ûn ne miro(mirov) in, ma ûn ji xelqên dî kêmtir in?, ûn hema hevdu dikujin, qet fenakirin(na nerin) wan memûrên neyarê ruh û malê we, ew her roj çend sedeka ji we dikujin, lê we haj xwe nîne!!...Pêximber ferman kiriye ku heger memûrekî zalim hate ser we, wî pê dest û devê xwe, heger nebî(nebû), bi şîrê(şûrê) xwe ji ser xwe hilînin. Nebêjin em nikarin, wekî mirv vî(xwest), mirov dikare.

Ûn qenc bizanibin ku heger ji Misqof an ji Ecem neyarek hate ser we, hikumet tu eskerî rênake ser we, divê we xwe haj xwe hebit. Ev hikumeta vî zemanî hewqas xirab biye(bûye) ku haj kesî nema ye. Xelqê Istanbolê jî ji hikumetê gelek aciz bîne, ew jî jar û reben bîne, fedkirin(dinerin) derdê serê xwe, gelek ji wan hawar û gazî kirin, şikat(gilî) li nik Xinkar(Sultan) kirin, Xinkar guh neda dengê wan. Ser rehetiya xwe, gelek ji wan nefî bîn(bûn), ew dîsa natirsin, heqê xwe dixwazin.

Ermenî ji zulma dewletê aciz bîn, dengê xwe hilanîn, destê xwe hilanîn, heqê xwe dixwazin, lê çiku kurd cahil in, dest kujtina Ermeniya kirin, kujtina wan li ser kurdan guneh e, ûn ji wan mezlûmtir in, lê çiku ûn cahil in, we haj xwe nine, ûn dengê xwe dernayinin, nexwe xirabiya li we dibe li Ermeniya nabe. We dît hikumetê çi zulm li we, li Hemawenda kir?, niho, heçku(ji ber ku) tu Hemawend li Kurdistanê neman, Hemawend hindik bûn, lewma hikumetê karî wan hemiya bigre bikuje, lê heger ûn hemî bi tîfaq bûn(bin), tukes nikare we, heger ev bêtifaqî li ser we dewam bike, qebîleyên kurda hemî yek û yek, wek Hemawenda wê ji Kurdistanê cida bibin, hirde wêde bin, destê zulma memûrên hikumetê jar û feqîr bibin, heyfa min têt wan(…) mêrên kurda nav sotarên wan memûra de misixre dibin.

Êdî bes e, çavê xwe vekin, destê xwe hilînin, şîrên xwe bikşînin, welatê we nav agirî de maye, ûn hemî nav tehlûkeyê de ne, tu emniyet ji we re, **D.R (9)**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk: Gotaeke helbijartî …**

jin û zaro a re nema ye. Herin dor mezinên xwe, herin dor ulemaya, hemî tîfaq bikin, xwe ji bin vê zulma memûran hilînin, ji we re fihêt e..!!.

Min, Istanbol terk kir ez hatim welatê xerîba de, de vê cerîdeya xwe binivîsim kurda re rêkim, de pê vê cerîdeyê kurda Îqaz(şiyar) bikim, vêca, ez hêvî dikim kurd jî guh bidin vê cerîdeya min, tiştê ez vê cerîdeyê de dinivîsim, hemî tiştên we ne ku Xwedê û pêximber emir kirine. Ya Xwedê emir kirî û pêximber emel kirî, mueyen(teqez) ji we re xêr e. Ez ji ulemayên(علماء) kurda hêvî dikim, vê cerîdeya min ji kurdê nexwendî re bixwînin, ji kurda re esbab û hikmetên van nesîhetên min bêjin, da qenc eqlê wan bikeve, ev li ser ulema deyneke mezin e. Divî Mîr û Axa jî arî ulema bikin, qedrê wan bigrin, ji xeberê wan dernekevin, çiku ulema wek enbiya(أنبياء) ne, çawa divê mirov itaetê ji enbiya re bike, welê divê mirov ulema re mutîe(مطيع) be.

Min cerîdeya xwe ya berî vê de behsa Kirêdê kiribî, ew ax welatê misilmana, axir, kete nav destê neyara de, hinde welatek pê zehmetî hatî sitandin, gelek hêsanî kete destê neyara de, çiku mirovên wê derê nav destê memûrên hikumetê de jar û reben bîn, ewan memûra pê zulma xwe ew erdê hinde xwe(…) axir avêtin nav destê neyarên me de.

Îro, sed hizar nifûsên Kirêdê hinde jin û zaro, ciwan û pîr nav destê neyarên file de êsîr mane, xidmetkariya wan dikin, ewan rebena hinde hawar û gazî kir, dewletê tu arî ji wan re nekir, ewan pê destê xwe çekên xwe dest şerî kir, gelek xîret kirin, lê dewletên fila arî fileyên wêderê kirin, top û tivingên xwe, waporên xwe ji fila re rêkirin, eskerê wan arî fila kir, misilman kujtin, misilman mexlûb bîn hatin kujtin, êsîr bîn. Xinkar ji wan misilmana re tu arîkarî nekir. Heger misilmanên Kirêdê(…) xwe ji bin zulma memûrên Xinkar derêxistana, îro erdê wan ew axa li ser mezin bîn, ew axa zaroyên xwe bi hinde delalî mezin kirî ji dest wan nediçû, eskerê fila ser kêfa xwe wekî rastî zaroke misilman dihat, şîrek(Şûrek) lê deda, da bizanibe şîrê wî dibire an ne..!!.Misilman holê dest wan de reben bîn, ewan ev hal hemî Xinkar re nivîsî, lê Xinkar tu rehim tu arîkarî ji wan re nekir. Misilmanên Kirêdê birçî man, tazî man, jinê wan kefîk nedîd(nedît) bidin serê xwe nav eskerê neyara de, jar û reben bîn. Xinkar ev hal hemî bihîst, ji wî re xelqê hemiya nivîsî, dîsa tu feyda xwe li wan rebena nekir, jin û zaroyên Kirêdê ji birça, ji serma mirin, dîsa Xinkar û mitirbên dorê ji sefaheta xwe kêm neman.

Gelî Kurdino, de vêca qenc bizanibin heger ûn niho ve fenekrin halê xwe, vê meskenetê bernedin, heger ûn dest hilneynin, heger ûn her holê bin zulma wan memûra de man, ev bela ê rojekê bê serê we jî, wekî ûn dereng man, êdî hawar û gazî feyde nake, lewma divê ûn niho ve fekrin xwe, divê we berê ve ji haj xwe hebe, heke ne, ûnê paşê peşîman bibin lê ew peşîmaniya paş, tu feydê nake..!

*** Kurdistan -hejmar 9 -18 Berçile 1898- Cinêv**

# Mirîşka kûr di xewnê de gêris dixe

Dîlan Zivingî

Cara pêşî dema ku ,Kurdistan di nêvbera herdu emperetoriyên bêbexit Osmanlî û Farisî , di şer û cenga Çelidîranê, ya di sala -1514-an de dibû, Kurdistana me , hate dubeş kirin. Ji wê rojê ve û ta roja me ya îro dewleta Tirk a faşî û dîktetor. bi hemû reng û sitîlên curbecur hovîtiya xwe, li sere gelê me yê kurd bi kar tine. Xêr û bêrên kurdistanê dadiqurtîne, encama kiriyarên yên qirêj û gemar bi sedan kuştin., girtin , penaberî, wêran, talan û kavilkirina gund û bajarên kurd kirine û hê jî di wa riyê de ew berdewam in. Lê belê . li raberî setem û hovitiya rêjimên tirkan, tu carî gelê kurd jî, serî netewandî. Bi dehan serhildan û şorveş bi serkêşiya leheng û nemirên mîna Bedir-xan beg, Şêx seîd pîranî, Seyid Riza û h.w.d lidarxistine . Lê mixabin , herdem serhidan û şoreşên kurdan , di bin pir sedem û mercên cîhanî , berjewendiyên dewiletên derdora Kurdistana îran, Îraq, Tirkiyê û Sûriyê ve têkiçûne! Ji ber ku, herêma kurdistanê hestewar û zengîne ; vêca jî, bûye kastîna ceng û şeran! Ev li hêlekê û li hêla dî, birek ji serok û rêberên Eşîrên kurd , di bin bandora ola îslamî û berjewendiyên kesîtiyên xwe ve, bi hêsanî dihatine xapandin. Weke nimûne , dema Bedirxan –Beg , di sala 1839an de ,li cezîra botan serhildana xwe lidarxit, hemû serok û rêber ên eşîrên kurd kom ser hevdu kirine, wisan jî , hêza Bedirxan begê , li pêş tirkan mezin û geş dibe . Hîngê cinêralên tirkan, ji hişimendî û dilêriya Bedirxan – Begê, pir bi tirs dibin ku, ew di serhildana xwe de bi serkeve . Loman jî , bi her reng û awî dijîtiya wî dikin , hin caran jî dixwestin wî bi xinizî bixapînin . Hekîbên zêran , weke xelat ji wî re bi rêdikirin. Lê tu carî Bedir- xan begê, xelatên Tirkan nedipejirandin û li wan vedigerand. Li dawî hin ji serok û rêberên eşîr ên derdora wî, bi xinizî dixapînin . Bi vê awî, hêza Bedir-xan begê ji hevdu dişele . Serhildana wî. Di -20-ê Tîrmeha sala 1847 de têkçû, û Bedir-xan begê penaber dikin , li dawiya jiyana xwe li welatê Sûriyê, li bajarê Şamê cîwar dibe . Di sala -1868-an de dice dilovaniya xwedê. Wisan jî , li raberî evqas sal xaka kurdisanê hêmenî nedîtiye , rêjîma Tirk ya faşî û şoven her dem gelê kurd , bi çûk weke kole û li pêş xwe dibîne . Loman jî, îro ew bê şermî destên xwe yên bi qirêj direjî kurdisana başûr ya federal nemaze kerkûka rengîn dike, gef û gûrên xwe,jî tûj dike . Îro -140-hezar leşkerên Tirkan. li sînorê kurdistana federal beşdar û amedeye li gor pêjin û xeyalên wan ku, ewê hêvî û armancên xwe pêk bînin û careke dî emperetoriya Osmanlî yê vejînin . Her weha , ew yê di roj hilatanavîn de bibine serwer! Lê weke pêşiyên me gotine, mirîşka kûr di xewinê de bi ser koma gêris dikeve û dixwe! Ma gelo kî nizane ku, dem hatiye guhartin û duhatî ne ji sîtemên dîktetor û şoven re ne ,ji aştî, azadî, demoqrasî û pejirandina mafên mirovan re ye. Vêca jî , ya çêtir ewe ku, rêjîma Tirik li xwe bizîvire û hebûna kurdan weke her miletekî dî bipejirîne. Pêwiste doza kurd çerser bike, belkîm karibe bi vê awî rûreşî û gunekariya xwe kêm bike, ta ku,hêmenî û aştî di hundir dewleta tirk de cî bigire.

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Kuştina….**

hişê xwe ronî bikin, û bêhna xwe fereh bikin ; û yek ji van bê ya din nakeve xizmeta me kurdan ; û bi taybetî jî ya me êzdiyan. U hên bêhtir ê bêhtir jî ya me jinan ! ! Ji ber ku em buhayê wê giran didin. Ne xema tu kesiye ku em bi hev kevin hev bikujin û serê hevdu bibirrin ; û bi kevran û kuçan, an kêran, an jî bi qurşînan, kezeba xwe bisotînin. ew rengek ji reşkujiyê ye ! U nîşana nezanî,tarîtî û şûnde mayînê ye .

D'ua , Kurd a êzdî, tu canemergê, tu nemirê ; tu her saxê ; cihê te, di dilê xortekî tenê de hebû, xortên nezan, cihê te heya bi heyê (heta bi hetê) di kuranî ya dilê her kurdekî bi rûmet de çêkirin; laşê te di hişê wan de kêrt kirin ; destên te yên zarokane, ku te dirêjî dawa xwe dikirinê ku tu laşê xwe ji nêrînên hovan biparêzê, dawa fîstanê te yê bûkane, kirin perda reş û bi ser çavên kesên nezan de berdan ; û rojek bê ; wê bikin kefen ji dijminên şoven re ; destên te, va di destên hemû jinên kurd û yên cihanê de ne ji bona xizmeta mirovatî ; wekhevî ; û hildana zordestî yê.

Navê te li ser te ye, Diroz (du'a) li giyanê te be, Du'a, tu bû yê canemerga civakî.

************************************

**Dumahîk : Hevpeyvîn…**

*divabû em bi zimanê Erebî bi merivên xwe re bipeyivin.*

**8-** Di nerîna we de, ew hilwesta we ya wê demê ji pilana Kembera Erebî rast bû ? .

***Bersiv****:Di baweriya min de, ew daxuyaniya ku me wê hingê da weşandin rast û durust bû, mêranî û wêrekî li gora wê demê têde hebû. Bi gelemperî, em li kar û xebata xwe ne poşman in, çimku, li gor zanebûn û karîna xwe, me di ber mafên gelê xwe de kar dikir.*

**9-** Hun dixwazin çi ji tevgera gelê xwe re bibêjin apê hêja?.

***Bersiv****: Partiyên me yên kurdî îro li ser riya xebatê li ber xwe didin, lê, hêviya min ewe ku ew lêvegerekê ji xwe re ava bikin, ew lêveger, nûnertiya gelê kurd ser û ber bike. Ya din, ez avakirina ragihandina Şamê gaveke li pêş dibînim, gereke em destên xwe têxin destên hêzên Erebî yên demokrat û bi hev re em kar û xebatê ji bo welatê me hemiyan Sûriyê û ji bo gelê xwe yê kurd bikin. Di baweriya min de, bi vî karê hevbeş, emê karibin guhertineke demokrat a aştiyane di welêt de peyda bikin.*

**10-** Ji keç û lawên kurdan re, hun dixwazin çi bibêjin, çi şîretên we ji wan re hene?.

***Bersiv:*** *Şîreta min a pîşîn ji wan re ewe ku ew li zimanê dayika xwe xwedî derkevin, xwe hînî xwendin û nivîsandinê pê bikin, ji ber ku ew zimanekî şêrîn û delal e, gereke em ji nijad û zimanê xwe fedî nekin, çimku ew jî mîna zimanê gelên cîhanê ye, ya din, ez dixwazim ew guh bidin xwendin, rewşenbîrî û zanistiyê, ji ber ku dema me ya îro, dema xwendin û zanebûnê ye.Ya dawî, ez ji wan re dibêjim, ji hevdu hez bikin, destên hev bigrin, rûmeta hev nas bikin, bera kîn û berberî û nezanî di civaka me de nemîne.*

**11**-Gotina we ya dawî ji xwendevanên NEWROZ ê re çiye?.

***Bersiv****: Ez sipasiya desteya Newrozê dikim ku îro ez hatime bîra wan, dilxweş im ku we silavek daye kalemêrekî xwe, yê ku rojekê di ciwaniya xwe de, di ber doza gelê xwe de girftar bûye, silavên min, ji xwendevanên wê re hene, dilê min bi dîtina we geş bûye, ez bi hêvî me ku rojên bên, rojên aştî û wekheviyê bin.*

Gelek sipas apê hêja.

Roja Înê : 25-05-2007

www.arsivakurd.org

**Dumahîk : 50î saliya.....**

pirsa program û xêza siyasî , pirsa em çi dixwazin û berê me li kû ye? zordariya girtinan û jiyana di girtîgeh û zîndanan de , rola têkliyan bi siyasetvan û kurdên kurdistana Turkiyê , Îraq û Îranê re , şêweyên kar û xebatê û şopandina jiyana hundir rêxistinê û vebrajtina kadroyan , tunebûn û xizaniya jêderên diraviya partiyê …hwd.

Divê bête gotin ku ev reng babet , mijar û pirsên weha bi hewcey rawestin û lêkolînên zanistî ne , ciyê wê ne ev sergotara ye .

Eve pêncî salin kar û barê rêxistinî , siyasî û rewşenbîrî , di nav gelê kurd de li Sûriyê , di heyameke pir dijwar û awarte de digere , û roj bi roj, xelkê kurd berê xwe dide tevgra xwe ya netewî ya demokrat , bihêviya ku , zor û setemkarî ji ser rabe , hebûna wî di destûra Sûriyê de bête pejirandin , rê li ber bikaranîna zimanê kurdî di dibistan û zanîngehan de vebe , bi Aştî , Azadî, Wekhevî, û bi Rûmet bijî.

Di vê pêvajoyê de , ji gelekan ve , ji xêrxwaz û xêrnexwazan ve , baş dixuye ku , siyaset û çalakiyên Parta Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê di nav gel û tevgera kurd de , bi erênî ciyê xwe girtiye , û her diçe şax û rêçên xwe di gund û bajaran de cî digrin , û di raya giştî ya Sûrî de jî , bi rêz û hurmet tête nasîn , li zimanê dê bûye xwedî, li pêdiviya danheva tevgera kurd bi dilsozî xebitiye û her dê bixebite, li beramber siyaseta şoven û setemkar bi erkên xwe rabûye û her dê rabe , herdem xebitiye ku rê li ber keysebazî û bazirganiya bi diruşmên netewî – kurdistanî û partîtiya teng bigre , û bide zelalkirin ku pirsa kurd li Sûriyê xwedî taybetmendiyek berçav û aşkere ye , û çaraserkirina vê pirsa me ya dadmend , tenê di peydakirina heyameke demokratîk û mirovane de , serê xwe dibîne . Lewre jî , di 1957-an de gava ku yekemîn partî dihate avakirin , peyva demoktratî di navenda wê de bû , û pêwîste em bi bîra xwe bînin ku , wê hîngê peyva demokrasiyê di edebiyat û jiyana siyasî a Sûrî de , kesî bi hesanî nikarî bû , anjî pê nebawer bû ku bikar bîne , ji ber ku , çanda serdest , çanda partiyên wê hîngê , mîna parta Be,is , komonîst , Îxwan mislimîn , Nasirî û Qewmî Sûrî bû û hew.

Vêca, pir hêja û ji mafê me kurda ye ku , em jî li Sûriyê , li doza demokrasiyê xwedî derkevin , parta me jî ligel partiyên dî yên tevgera kurd , bi rêz û hurmet li pêncî saliya damezrandina yekemîn rêxistina siyasî a kurd , bibe xwedî , kumê xwe jê re deyne û bejna xwe ji vê bîranînê re bitewîne.

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org